HELBESTVAN ŞARL PÊGU



Wergirandina ji Frensî: Anahîta Hemo

Lavijek bo şevê

(*Di vê helbestê de, yezdan bo şevê diaxive*)

Oh şevê, oh keça min şevê,
tu dizanî ku tu bê deng dibî
Oh keça min bi wî mantoyê rind.
Ho şeva min ya bi sitêran te çêkiribû berî her kesî.
Ev mirovên ne li ser hev wê çawa mirov razînî,
şevê tu pîrozî, şevê tu gewreyî, şevê tu rindî, lewendî,
şevê bi mantoyê xwe yê mezin.
Şevê ji te hez dikim, silavên germ li te dikim û ez bi te serbilind im
û lavijan dibêjim,
tu keça min ya mezinî û afrandina minî,
Oh, Şeva xweşik û qeşeng, şeva bi mantoyê mezin, keça min
Bi mantoyê ji sitêran,
Tu dihînî bîra min,
ev bêdengiya mezin ya peyda dibe,
li ser rûkê cîhan bi tevaya xwe,
berî destpêka seroktiya mirov.
Te diyar kir bona min, ev bêdengiya mezin,
piştî dawiya seroktiya mirov dema ez bibim,
careka din "koçan"* yê xwe,
dema li pêş gelek caran, ji ber ku vî mirovî
pir heydedan, qerebalix, lê kiriye .

**** Koçan: Darê di destê padîşah de(li vê derê padîşah yezdan e."scepter", bi zimanê frensî, Cihok.***